

Pirsgirêka Kurd an, zêdetirî pirsgirêka netew, pirsgirêkeke hebûnê ye

Min daxuyaniyên Wezîrê karê hundirîn, Beşîr Atalay û reaksiyonên li hemberî vê, ji radyo guhdar kir. Ez wekî kefa destê xwe, dewletê dizanim. MHP jî, CHP jî di nava sere min de ne. Heta di radyo, di puxtayên (özet) çapemeniyê û Rojnameya Sebah de behsa daxuyaniyên Tuncay Gunay kirin. Tuncay Gunay dibêje “yê herî baş dewletê nas dike Ocalan e”. Min baş dişopînin. Ji bo nexşeya rê bikeve destê serkar (müdür), hîn zû ye. Hîn di destê dewletê de ye, lêdikole. Yên me, Ewropa, aliyê Kurd çi dibêjin, ji min çi hêvî dikin?

Bi qasî di çapemeniyê de tê xuyakirin aliyê Kurd daxuyanî daye ku wan pêvajoya bêçalekiyê heya roja dawiyê ya cejnê, dirêj kirine. Dawiya cejnê, rastî çendê mehê tê? Dibe 23ê Îlonê be. Li Surî, Îran û Iraqê rewş çawane? Mîtînga Amedê çawa bihorî, tevlibûn çi qas e? Kî axivîn? Mîtînga herêmê bû yan di asta herêmî de bû?

Ez di derbarê mîtînga Wanê de vê bêjim. Ez gelê Wanê û mîtîngên wan ên çareserîya demokratîk, silav dikim. Pirsgirêka Kurd zêdetirî pirsgirêka netew, pirsgirêkeke hebûnê ye. Têkoşîna ku gelê Kurd daye, têkoşîna hebûnê ye û berdewamkirina heyîna xwe ye. Gelê me wê berxwedaniya parastina heyîna xwe û bi destxistina azadiya xwe, berdewam bike. Divê gelê me mafê xwe yê çalakiya demokratîk heya dawiyê bikar bîne, sazibûnên xwe yê demokratîk kûr bike. Divê her kes xwe di vê pêvajoyê de bîyardar bike, xwe pêşbixî û serwer bike. Ez di vê bingehê de gelê me yê Wanê û mîtîngên çareserîya demokratîk ku dê bikin, silav dikim.

Di çapemeniyê de gotinên Aysel Tugluk ên wekî “eger ev pêvajo baş neyê bikaranîn, dibe cûdabûn pêşbikeve”, çelaxwer dikin. Ez bawerim Ruşen Çakir, di mîtînga Amedê de daye nîşan ku aktorên bingehîn ên vê pêvajoyê Ocalan û PKKe ye û gotiye yê ku berovajîtiya vê dihizirin xwe dixapînin û di vê mijarê de ew bi xwe jî xapaye. Ev rewş, ev rastî tê dîtîn, ma ne we ye? Avnî Ozgurel jî di nîvîsa xwe ya qûncik de diyar dike ku hukimet li ser afûyekê ku zagonên kevin ên poşmaniyê derbaz dike û sînanan tangav dike, dişûxile. Hîn dişûxilin! Nexwe hîn li hole tiştek nîne. Hukimet zehmetiyan dikişîne, heta pir zehmetiyan dikişîne.

Belê, her kes benda min e ku ka ezê çi bêjim û çi bikim. Tê dîtîn ku ev pirsgirêk di xalekê de ne tenê DTPê, yê din jî derbaz dike, ne we ye? Çi ji min hêvî dikin, bendêne ku ez ya ji vê şûndetir jî bigrim ser xwe, ne we ye? Eger tiştek ji min tê xwestin, eger berpirsyartî didin ser min wê demê divê pêşiya min were vekirin, eger tê xwestin ku ez siyasetê bikim, wê demê divê ez azad bim.

Xebatên Partiya Sîwan çawa diçe, di kîjan rewşê de ne? Kî xebatên Partiya Sîwan rêve dibe, çi dibêjin? Ez behsa demokratên liberal û demokratên muhafazakar nakim, ji xwe ew nabin jî. Ev proje, projeya demokratên radîqal e, siyaseta demokratîk e, projeyeke zagonî ye.

Ev kar tenê bi Rizgarîparêzan re û bi Kivîlcîmparêzan re nabe. Rizgarîparêz kîne, ji devdorê ODPê ne? Ma ew ji ODP cûda nebûne? Ufuk Uras ew çi dikin, di nava xebateke cuda de ne. Çi

kir in, karên partiyê tamam kirin? Hevalên ku xebatê rêve dibin dikarin di mijara rêbaz de, ji parêznameyên min sûd wergerin.

Ez rewşa lîberalên li Tirkiyê baş tehlîl dikim. Ez rewşa çepê li Tirkiyê xwe ji salên 1975an, ji ADYODê û vir ve, baş dizanim. Ez kevneşopîya Dev-Genç, Dev-Yol, Dev-Sol, dizanim, ji salên “80, 90, 2000an” ve dúbare dúbare ceribandim, lê serneketim. Niha em di salên 2009an de ne. Rewşa wan weke Tekkeyan e, hejmara wan kêmtir e, hêza wan a nûneriyê lewaz e û bi pirsgerêkên xwe yê navxweyî re mijûl in. Divê demokratên Radîkal li gel hev bicivin, lê di vê qadê de valahiyek pir mezin heye, nexwe nikarin tije bikin. Tu kes nîne ku ji vê re rêbertî bike, li vir pirsgerêka rêbertiyê jî heye. Eger ez a niha li dervebam, mine di vê bingehe de partiyek damezirandiba, min dê demokratên radîkal li hev civandiba, ezê biçûbama ser wê. Li Tirkiyê, di vê qadê de, valetiyek heye. Tenê yê ku xwe fedayî vî karî kirine, yê dixwazin di vî karî de berpirsyartiyên bigrin; yê bi demokrasîyê û vi gel re girêdayîne, dikarin vî karî rêve bibin. Divê ji herêmiyan, rêxistinên xurt bîr afirandin. Ne hewceye xwe ileh weke partiyekê jî rêbixe. Eger rêxistineke cîdî di van xebatan de bê kirin, dikare serkeftinên ku AKPê, CHPê û MHPê jî derbaz dike bidest bixe. Di vê projeyê de cudahiya Tirk-Kurd nîne, ev projeyê Tirkiyê ye. Ev proje projeya dem dirêj a qezenckirina pêşeroja Tirkiyê ye.

Yên li Ewrûpa çî dikin, çî dibêjin, di roj tv de baş tê nîqaş kirin? Kî derdikevin, kî nîqaş dikin? Nazmî Gur çû cihê wezîfeya xwe? Ebru çî dike, hîn di girtîgehê de ye? Di kîjan girtîgehê de ye? Ez silavên xwe jê re radigihînim. Ji xwe di çarçoveya KCKê de, tê nirxandin. KCK, tişteke ku bi min re destpê kiriye û bi min re jî xilas bibe ye. Eger pêwîst be ez jî dikarim di derbarê vê doze de nêrînên xwe û îfadeyên xwe pêşkêş bikim. KCK li Tirkiyê ne rûnişt ser zemînekê zagonî, KCK li Tirkiyê hate rewşeke wisa ku nave wê heye, lê ew bi xwe nîne. Ji loma ewê parîzin an neparêz in, ev karekî ku ew dizanin e. Ma doza KESKê jî bi KCKê re girêdan e. Doza KESKê, ne we? Divê akademyên siyasî di her bajarekê de werin vekirin, divê hebe jî. AKP, di vê mijarê de pêşde çûye, vî karî baş dike. Min pêşniyar kiribû ku li Amedê Akademyeke Jina Azad bê damezirandin.

Her cihê wê hatiye, ez di mijara jinê de jî dikarim van bêjim:

Pirsgerêka jin, encama çanda tecawûza bênc hezar salî ye. Ez her ku li vir vê mijarê hîna jî lédikolim, dixwînim, ez dikevim nava dehşetê. Jin hîna jî di rewşeke ku ev pirsgerêk fêrnêkirine, tehlîl nekirine de ne. Divê jin pirsgerêka xwe fêmbikin, tehlîl bikin. Hun dê di ferqa zayend/cînsa xwe de bin, hunê xwe nasbikin. Ez dibêjim jina azad, lê vê yekê weke azadiya zayendî/cînsel çalexwer dikin, hertiştî di çarçoveya zayendî de digirin dest. Li Ewrûpa laşê jinê bi awayekî xurt derdixin pêş, sor/tehrîk dikin, jinê dikin meta. Nêrînên we cûda ne, xwe ji pore xwe bigrin heya neynûka xwe hun nizanin ka hunê çawa xwe bişêwe (şekil) bikin. Ji ber vê min daxuyanî ji bo Akademya Jinê ya li Amedê da. Perwerdekirina zarokên keç, girîng e. Heta malbatên zarokên keç jî nikarin wan perwerde bikin. Hunê vana mezin bikin. Vaye tê zanîn, tiştên weke ensest ên di nava malbatan de, di têkiliyan de encamên fatîsîner diafirîne. Divê li hemberî tevahiya van tiştan tevdir (tedbîr) werin girtin. Jinek dizewice, lê piştî du mehan şekil û

şemala wê diguhere û dûra jî jin hewl dide xwe bi meqyajana tamîr bike. Divê jin parastina xwe ya cewherîn pêşbixinin. Ez xwe li vir weke giyanî/rûhî diparîzim. Eger parastina min a cewherîn neba, eger min wisa nekiriba, min nedikarî di nava deh sal an de, weke psîkolojîk ew qas xurt bam. Nexwe kevir jî be, nikare li vir liber xwe bide. Teşeya min a jin girtina destê xwe, felsefîk e. Ez weke perçeyeke xweşikahiyên xwezayê û estetîkekê digirim dest. Jin wate ye. Hegel, hewl da bingeha felsefeya xwe yekem car li ser têkiliyên jin-zilam çêbike. Lê dema ev sernexist, felsefeya xwe li ser têkiliyên kole-efendî di damezirîne. Ez felsefeya xwe li ser mere qûrnaz, bihêz û jinê didamezirînim. Jina herî saf û herî xweşik li hemberî zilamê qûrnaz û bihêz, di nava çend mehan de, van taybetmendiyên xwe winda dike. Hun dizanin, di wateya aqîl û qeydan de têgeheke Yewnanî, “nomos” heye. Bi Tirkî jî weke “namus” tê bikaranîn. Di ferasata min a namûsê de jina bi namûs, jina ku xwe azad kiriye, xwe bi xwe qeydên xwe diyar kiriye, qeydên xwe ferz dike û dide jiyîn e. Jina ku girêdayî zilam e, jina ku qeydên zilam wê diyar dike û ew xistine malê, ne jina binamûs e. Di Sumeran de jinên herî esîl-xweşik, di tapinaxên Zîguratan de, bi yên esîl re jiyana dikirin. Jinên din jî bi teşeyeke hîn kirêtir dizewîcîn, ew dixistin nava malê. Di rastiyê de dûra tapinax jî hatin çalexwerkirin. Ez, têkiliya bi jinê re dişibînin awazeke ku ji alava (alet) mûzîkekê derdikeve. Bila ev li vir şaş neyê fêmkirin, dema ez dibêjim alav, ez behsê alavkirina jinê, amûrkirina jinê nakim, ez behsa domdariyê dikim. Tiştê ku ez hewl didim bidim fêmkirin, eger bibe hewldaneke li ser esasê rastî û fêmkirinê, wê bibe têkiliyeke ku xweşikahiyên cûrbecûr hembêz dike, xwe hertimî nû dike, teze dike ku wê têra temenê her du aliyan bike be. Helbet di vir de zilam jî girîng e. Eger zilam jî dixwaze vê xweşikbûnê bijî, divê di vê bingehe de bi jinê re hevdiîtinê çêbike, nexwe wê berovajîtiya vê her roj çanda tecewîzê ku xwe dispêre zayendîtiyeke zorî, çewisandin û koletiyê, derbikeve hole. Vaye hun dibînin, di bin nave evîne, heskirinê sere keçên cipciwan jêdikin. Jinên ku min dişopînin û bi îdfayin dikarin li ser van tiştên ku min diyar kirine kûr bibin. Ji xwe di encam de ev nêrînen min in, ez wisa li meselê dinêrim. Ez di vê bingehe de tevahî jin an silav dikim.

Aysel Dogan her hefte nameyek rêdike, pêşniyarên wê yên ecêp hene. Çi dike? Dikare li Dêrsimê bimîne. Dikare ji xebat û saziyên wir re hêz û destek pêşkêş bike. Dêrsimî pir diaxivin, lê dîroka xwe jî nizanin. Seyîr Riza jî rast û dirûst fêm nakin. Divê bizanibin ka çi diaxivin? Pêwîst e bizanin Elewîti çiyê? Temam çandeke wan a berxwedanvanîyê heye, rêzgirtina me ji viya re heye, lê belê mijarên ku em dibêjin divê têbigihin. Dikare li wir navenda çanda Elewî were çêkirin. Her wiha li Riha dikarin lêkolîna olan were çêkirin. Di vê mijarê de xebat dikarin werin kirin. Heta pêşniyariyeke min heye; ên nêzîkê me ne dikarin li Amedê Komala Çanda Îslamî saz bikin. Li vir xebatên di derbarê Îslamiyetê de, dikare were kirin. Şaş têgihîştina olê heye, ol tenê nimêj kirin û rojî girtinê dihesibînin. Bîrdoziyeke ol heye, pêwîst e fêmkirin û nîqaşkirina viya çêbibe. Min di parêznameya xwe ya di bin navê Demokratîk kirina Çanda Rojhilata Navîn de amadekiriye de, bi awayeke berfireh li ser van mijaran rawestiyam. Dikarin ji parêznameyên min sûd wergirin.

Baş e, ji xwe dema hun jî tèn we dîtiye, li vî aliyê kêlekê de hindek tiştê tamam kirin e, ên ku werin vir wê kengî ser lêdanê bikin? Eger wek di çapemeniyê de hate xuyakirin 10 kesan şeş kes ji çepên Tirk bin, Hizbûlah, ÎBDA-C û yên ji sûcên çete ceza girtibin be, wê demê ev nêzîkatiyeke bi mebesta îmhakirinê ye. Ji qismên cûda mehkum anîna vir, tê wateya rewşa min jî gefek e, tê wateya ku em jiyana te tehdît dikin e. Min hefteya bûhurî de gotibû; ew bûyera avêtina erdê û bi mirinê tehdît kirina min, çêbûbû. Wê ewlekariya min ya vir kî bigre? Ez ne mehkumekî ji rêzê me, ji xwe ez xwe weke mehkumek jî na pejirînim. Rewşa min ya li vir ne mehkumiyet e. Ez rewşa xwe ya vir weke hewldana Gladio ya bê bandorkirina xwe pênase dikim. Ev rewş hîna jî di ajo, hîna jî min dişopînin. Yê min aniye vir, Gladio ye. Ew wezîfedarên li Yewnanîstanê jî, parçeyekî Gladione. Ev kar ji aliyê Emerîka û Înglîstanê ve hatiye birêvebirin. Gladio ya Yewnanîstanê ez bi rengekî dostaniyê, li beramberê Grevên Ege û Kibrisê radestî Gladio ya Tirk kir im. Ev tev didin nîşandan ku ew komplo ya li ser min hîna jî di dome. Gladio hîna jî heyîna xwe dide ber dewamkirin. Parçeyekê Gladio ya li Tirkiyê Ergenekon e. Ew qeyt nenasên di nava me de Şemdin Sakık, Çurukkaya ew jî dirêjahiya viya bûn. Ev Ergenekoniyên hatine binçavkirin yê qeyd nenas in û tenê bi qasî sedî yek yê Ergenekoniyên in. Yê din sedê not û neh jî li dervene û li ser kar in. Di pêvajoya niha de eger tiştê neyê pêşxistin, mîna dema Demîrel de bûye eger ronahiyeke kesk were pêxistin, wê her der di nava xwînê de bimîne. Pêwîst e herkes di vê mijarê de hişyar be. Va eger çareseriyekê demokratîk pêşnekeve, wê qirkirinên komî werin jiyankirin. Mîna ew komkujiyên li Riha û Silopiya yê bûye, dibe ku DTPyî jî werin kuştin û çawa hatine kuştin nezanin. Divê karê pêşîn yê DTPê dîtina talûkeyan be û her wiha wê ewlekariya xwe çawa bigrin be. Va ew qirkirinên li Serêkaniyê û Silopiyê, her wiha ên hatine kuşt in, ji bo çî hatine kuştin jî nizanin. Di nava êlên (eşîret) li vir de rêxistingeriyên bi şêwazê Ergenekon hene. Evna elên cerdevanan in. Ez ji vir têdigihişim ka çawa hatine kuştin, lê ew fêhm nakin, pêwîst e mirinên xwe, çawa hatine kuştin fêhm bikin.

Li gorî di çapemeniyê de hatiye xuyakirin ji Adarê ve 54 gerîla jiyana xwe ji dest dane, ew wendahiya gerîla ya li Dêrsimê çawa çêbûye, di pevçûnê de ye? Bûyera Şemzînan çawa qewimî ye? Wendahiya rast çiyê? Ha, wê çaxê wê ji bo 30ê Tebaxê komek îmhakiribana û her wiha wê xwe pêşandana serkeftinê kiribana. Ango dibêjin 8 esker mirine, tiştê ku ew gotine giring e. Her hal hema hema li her derê operasyon didomin.

Ez PKKê û gerîla nas dikim. Dikarin, xwe baş biparêzin. Tenê dibe ku pêşketinên ku PKK jî hêvî nakin çêbibin. Eger AKP ji bo çareseriyê vê pirsgerêkê gavên cidî ne avêje, mîna hikûmetên din wê di sê-pênc mehan de belav bibe. Ji xwe tiştê CHP û MHP jî dixwaze ev e. Eger çareseriyê demokratîk pêşnekeve, dibe ku Tirkiye ji ew şerê di salên 1990an û 2005an de derketiye hole hîn zêdetir di radeyeke bilindtir de rû be rû bimîne. Ev wisan bi parastina pasîf, parastina çalak re jî nabe. Li gorî ku Karayilan ew jî bi vî şêweyî daxuyanî dane, bi bandora krîzê re jî tevlibûn ji PKKê re zêde bûye û her wiha her hal rewşa wan hîn bihêztir e. Evna xwe li wir baş perwerde dikin, amade dikin, eger çareserî pêşnekeve dibe ku li aliyê gerîla de teqandinên ku pêşî lê nikare were girtin pêşbikeve.

Pirsgirêka Kurdistan ne pirsgirêka netew e, pirsgirêka heyînê ye. Ew şerê ku didin jî şerê hebûnê, domandina heyîna xwe û azadiyê ye. Pirsgirêka Kurdistan pirsgirêkekî jiyanî ye. Cûda jî, ne pirsgirêka Tirkîyê ye, pirsgirêka yekbûna Tirkîyê ye. Ev DTPyî jî carnan çî daxivin nizanin. Aliyek dibêje “eman em hatin parçekirin, wê me ji hev parçe bikin” aliyê din jî dibêje ku “wê cûdabûn û parçebûn were nîqaşkirin”. Na, ne wisa, her du jî nabe. Çareseriya ku min pêşkêş kiriye, projeya qezenckirina paşeroja Tirkîyê ya dem dirêj e. Ez rica ji Birêz Erdogan dikim. Rewşekî me yê em li pêşiya çareseriya pirsgirêkê de bibin asteng nabe. Berovajiyê vê em didin xuyakirin ku tiştê ji destê me were em dê bikin.

Di nexşeya rê de, di bin şeş serdêran (başlık) de pêşniyarên min yên çareseriyê hene. A yekemîn beşa ketinê ye, prensîp li tê de cîh digire. Yên din jî tiştên li Tirkîye, Kurdistanê werin kirin e û qismê encamê ye. Di heftaya derbasbûyî de min gotibû 9 presîp. Prensîba 10. ku min ji bîr kiriye heye. Ev Destûra Bingeîn a Demokratîk e. Pirsgirêkên herî bingehîn ên Tirkîyê bi Destûreke bingehîn a Demokratîk re dikare çareser bibe. Di girîngiyeke jiyanî de ye. Di heman demî de di beşa serdêriya ji bo çareseriya vê pirsgirêkê demokratîk kirina Tirkîyê û çareseriya pirsgirêka Kurdistanê, min behsa sê modelên çareseriyê kiriye:

A yekemîn, modela çareseriya tunekirina ji kokê ya li Tirkîyê tê pêkanîn e. Ji xwe ev ji kokê, bi temamî tunekirin, xilaskirin û asîmîlasyon e. Modela heyî ya heta niha hatiye pêkanîn e, tunekirina ku ji kokê da xwastine bidin meşandine û asîmîleker e. Encamên vê modelê di holê de ne, pir mezin daye wendakirin.

A duyemîn modela netew-dewleteke biçûk e. Va ev taxtîkê Îsraîl û Emerîkayê ye. Mîna ku li Başûr bûye, tu dê bi çekirina dewleteke biçûk re her tişt hepsê wir bikî. Ev model, modela bi çekirina netew-dewletokê biçûk re, pirsgirêkê di vir de heps kirin e. Di nava vê de PDK heye, DYE heye, Tirkîye heye, AKP heye. Va wekî Îsraîl li Başûr netew-dewletokê biçûk bide avakirin her wiha wê ji sîstema emperyalîst re xizmet bide kirin.

Modela sêyemîn, modela çareseriya demokratîk a me pêşniyar kiriye. Tu wê pirsgirêkê di aliyê têgihîştinê de hildî dest. Tu wê yekbûnê esas bigrî. Di modela min de herkes dikare xwe azadane vebêje. Ji bo jinan, ciwanan jî wisa ye.

Vaye Dawitoglu, di nava ew pêşniyarên ku min berê niha kiribûn de, pêşniyara min a ‘di qontarên Dicle-Firat de konfederasyona çandinî, av û enerjî’ a niha girtiye, hewl didin derbazî jiyanê bikin.

Her wiha di nexşeya rê de plansaziya çalakiyeke sê xalî heye. Ez dê vana li vir bi detay venebêjim.

Her hal ew tiştên ku min di çapemeniyê de gotiye mûçink dikin û vediguherin propagandayeke dijberî me. Bila vana derbas bikin, hindêk dirûst bin. Min heftaya derbasbûyî jî gotibû, ez yekem car vê nabêjim ku Sultanê Selçûqîyan Sencer di 1060an de dibêje. Ne tişteke piştî hezar sal an hatiye kifş kirine. Evna wê bikarbînîn, ev tişteke ku her timî dikine. Bila nekevin nêzîkatiyên wisan erzan. Dikarin van mijaran di hevdîtinên xwe yên bi rojnemevanan re bînin ziman.

Ji bo rêveberiyên herêmî em dikarin di hefteya pêş me de hîn zêdetir bi detay nîqaş bikin. Silavên xwe yê taybet ji hevalên jin ên li Mîdyatê re û hevalên li Tekîrdagê re radigihînim. Min nameyên wan girtin. Ez silavên xwe yê taybet ji hevalên rewşa xwe ya tendûristî nebaş re, ji Gulîzar Akin a rewşa xwe girane re, ez bawerim ku li Semsûrê ye bû, rê dikim. Bila baş li xwe binêrin, moralê xwe bilind bigrin.

Ji herkesê re silav.

Rojbaş

2ê Îlon 2009